KIRYARA PERWERDE Û FÊRKIRINÊ LI BER RONAHIYÊ

Mislim Batêlî

Perwerde û fêrkirin dor hokarên giring û binyatêne û temamkerên hevdûne, bo pêşkeftina zanîn, zanistê û kulturî. Hind di her civakekê de, lewra pîtedan û piştevanîkirin û arastekirina wan pîvan li ser sîtemên nû bi plan û jîrî, dê werar û pêşkevtinin û guhortinên saxlem li ser hemû astan peyda bikin. Berî em li ser tewerên vê gotarê rawestin em dê zaravekê perwerde û fêrkirin bidine nasîn.

Mamosta û pisporê perwerdeyê Robert Botrans, perwerde wesa daye pênasekirin: "ji lênêrîna gişтî ve, perwerde kareke berû yan xelkên din dêşite arastekirin, perwerde ya xweyî karekê pêdivî û berdewam mirov pê ve pabent dibe, ji bo hindê ku bi komeka armancan der encamên diyar kirî bigehin; mîna derkewtin ji rewiştên xerab yan jî rizgarbûn ji wan kêm û kasiyên ji ber dinalandin, yan wergirtina rewşenbîriyeka zêdetir, mîna fêrbûna şêwazekî hunerî û gengeşekirina şiyanên pêşiyan.

Her çende eve ne pênasîneka standerte û gelekên din hene û hemû boçûn sebaret pênasîna ''fêrbûn'' dihate xuyakirin (guherîneka bi ser mirovî de bihêt, bi cihînan her karekî de navê lê dikin fêrbûn).

(2)

Berûvajî ramana (fêrbûn)ê jî nexwîndewariye û (nexwîndewarî) "ji wan arîşeyên mezin yên cîhana geşekirî tûşî dibe. Lewra dibe asteng beramber hemû layenên pêşdeçûnê, giştandina fêrkirinê rêza nexwîndwariyê kêm dike û dê astê rewşenbîriya takan bilind bike".

(3)

Lewra di wan her du waran de guherînên bi tawetî û ezmûnegeriya bi pilan û jîrî ji pêdiviyên kiryara ezmûngerî li ser nimûneyekê û qewarekî destnîşankirî û bo demekî diyar, dihê encamdan. Lê ne li ser astê herêmekî bi giştî û sebaret (perwerde û fêrkirinê) li qunaxa seretayî, dê ev tewere bibine hêviyê babetê me; *(1)* guhurînên

zaravayên peyrewan: Sepandina zaravekî li ser yê dî xizmeta zimanê yekgirtî kurdî nake, çunku, di topografiya Kurdistanê de pitir 80% ji pêkhatên civakî kurmancin û di dîroka nivîsîna wê ji hemû diyalîktên din yên kurdî kevintire.

(4)

Ev car guneha xwendevanên (1213) xwendingehan çi ye? Bibine qurbaniya biryareka takyeklayî nesaxlem ya ezmûna navçegerî! Eve jî dibe hokarekê karîger bo dabezîna tirêja derçûyî astê zanistî zêdebarî mezaxtina serma û pareyekê mezin di vê guhorînê de, zorba giring pêdiviye zarok bi zimanê dayîka xwe re baxive û binivîse çinku *(2)* mafê redeye her zarokekê ye.

2-) **Ezmûnekan:** derbaryî ezmûnên (nîva salê) 2005-2006-ê yên polên destpêkê 1-2 û li dûv raspade û rênmayên serpereştan nehatine encamdan. Lê, îsal 2006- 2007-ê her wan polan ezmûnên nîva salê encamdan. Çi serbûre? Bo çi bûne encamdan, ji ber çi neşêne encam encambidan?

Baştire ewe her sal bihêne encamdan.

Derbareyî ezmûnên giştiyên şeşî seretayî ewên ku li ber bihêne kirin li jivanê destnîşankirî, derbareyî ezmûna roja êkê yên (zimanî) di êk dem û di êk rojê de. Ez bawer dikim wek destpêk dê bi aloz û zehmet be. Xwendekar nikare wek pêdivî serederiyê û hevkariyê hema hengê dê bike li berhevkirinê û dê astê dariştin li cem xwendekaran dabezînin çimku di ezmûnê de nahête bikarînan û xwendekar xemê jê naxwin mîna ezmûnê piroveyî derbareyî ezmûna duwê jî du babetên ji yek cûda ne û xwendekar dê pêkolê bike. Sivik pêdaçûnê peyda bike. Li berheva pirsiyarên tixûb dayî bikarin di encama de babet wek pêdivî berhevê nahête kirin û di encam de dê rêja derçûnê ji astê pêdivî gelek kêmtirîn taqî kirinê.

Di piroveyê de rêja derçûnê li ser astê giştî wek pêdivî nebû

Derbarê ezmûnên komelayetî ayinê Îslamê vederkirina wan ji ezmûnên giştî biryareyeka ne saxlem û dizanim çimku dê wek babetê çandina cara dihêt û dê xwendekar bi çavek sivik û ne girîng lê binihêrin. Ev e jî kêmkirina û sivikkirineke bi van her dû babetên pir giring û zindî çi ji layên niştimanî û rêya neteweyî û ji layên ayinî ve gelek baş e. Heger ew her dû babet li ezmûnên giştî bihêne encamdan.

3-Nemrekan: Sebaret polên destpêkê 1, 2, 3 û piştî çendîn carên alugurkirina bîrûboçûnan û rasyar dewrû rênmayan ji kargêriyên xwendigehan hate xwestin ku nimrên ezmûnên nîva sale 2006-2007 li ser lîsteyên takî û tomnran wek nimre û hêmaya dihête tomarkirin

û li ser kartan tinê hêma bihête nivisîn ji bilî tomara gişti ka dê çawa bin lê nimrên pola çarê berûvajî yên dê bi tenê nimre li hemû lîste û tomaran bihête nivîsîn, her çende sercem ji 10 nimre ne baş e, bo çi? Nimrên pola çarê jî mîna polên dî yên destpêkê nabin?

4- **Tomarekan:** Piraniya wan wek şêwe naverok kilasîkîne û pêzanînên tê de wek ziman bi erebîne! Di biyavê nivîsînên nimran gelek bertengin! Zor giringe bihêne guhorîn li diwên şêwê serdem.*(4)*

5- Seredanên serpereştan berî ezmûnên (nîva salê) dûmahiya salê bo xwendingehên seretayî bo dûvçûn û çaweniya berhevkirinê û lênêrîna pirsyaran karekê zor giring û pêdivî mîna qonaxa navincî. Çinku dûvçûn û helsengandina pirsiyaran pişti ezmûnan karekê kiryarî û bi sûd nîne! Başe seredanên seretayiyan berî ezmûnan bihê kirin. Derbareyî mîdaliya û şêwe û sexletên çêkirina wê nîşanên dî. Baş e kargêriyên xwendingehan çi (nebijiye) li ber destane da ku bişên li gor wan saxletan durist bike? Baş e perwerde bi xwe pê re be û dabeş bikin.

6- **S**emîner û waneyên meşqkirinê: Bêguman daneveya semîneran û waneyên meşqkirinê bo hindê ye, astê şiyandinê mamostaya bi hêz û bilind bin. Hokarê demî zor giringe bo vekirina van xol û sinar û waneyên meşqkiriyê, çinku heger ey çelakî hatine encamdan li heyfa (11-12) hinge wek pêdivî mifa jê nabîne wergitin, çinku mamosta dê gelek caran wergire. Li pirsîn dêspêkê, taybetî bo layenekê zêdebarî li pol û batên dî jî başe li destpêka salê bihêne encamdan.

7- **Sizadan:** Qedexekirin û neqedexekirin: pişti çendîn salên qedexekirina sizadana xwendevanan û peyrewkirina wê biryarî li sinorê îdara Herêmê û pişti herdu îdare bûne yek îsale û pişti nîva salê bûrî, wezareta perwerda hikumeta hevgirtî bi nivîsarekê amaje daye hindê ku her xwendevanek li mamostayî û yasa û rênmayên xwendingehê negirt bihê sizadan. Li xuya nekiriye ka çawa bi çi reng bihê sizadan. Wesa naverok bi mijdarê hatiye wergirtinê û bijandin û di xwendingehan da dijwariyê dest pê kir û paş bi demeke kêm rêveberiya qeza Duhokê agehdariya xwendingehan girt ku merem ji vê nivîsarê ew nîne qutan careka din zivirî. Li vê derê serûber û serderî taylozê şilêr bû çimkî em wek mamosta dibêjin. Baş e, heger merem pê nezivrîne xwendingehên pa merem jê çiye?

8-Pargeh û Pêdawîstê(qirtasiye) rolekê giring digirin ji bo xwendina xwendevanan û asankirina giriftarên girînê û xweşkirina rewşa prosa perde fêrkirinê li her dem û cihekê lê pişti yekbûna her

dû îdareyan kêşeya fêrgeh û pêdawîstan peyda bûn. Zêdebarî nebûna gaza spî heta piştî nîva salê û seyandina zaravê soranî ser zaravên dî. Paşe ew pêdivî di destpêka salê berhev dibî û hemû bizav pêxemet bilindkirina astê zanistî. Çimkî (takî civakê çend pileya wê ya rewşenbîrî û astê wê yê zanistî bilind dibe ew dê pitir karibe bi şêweyekê jêdarî serderiyê di gel kêşeyan û pirsiyan bike û tûşî çawaniya biryardanê nabe)*(6)*.

Berî dawê hêvîdarim her guhorîn û biryardan û rastpardin û rênmayên perwerde û fêrkirinê li herêmê verêja hezara konferansê rapirsiyan ta û şarezayên warê perwerde û fêrkirinê bin. Ev e ji layekê fewzulayekê dî ve yekbûna serperiştê li perwerde û fêrkirinê û karekê girîng karkire ji bo hengavtina yek armanc û yeksentan û hizran. Binyate ji bo mukimkirin û yekbûna neteweyî lewra Dr. Mixtara Fehamê dibêje: "Firelayen ya serperiştiyê li fêrkirinê û fireîdeolojiyên ku hatine arastekirin di dewletê de û karekê tirsnake li ser yekbûna neteweyî û paşeroja wê an ku ramana wê fireyî ji hev dû dûratê (midnafir), di hizirkirin û di sentan de û armanc ji hev dû dûrên lewra dûrxistina hemû regezên hişkbaweriyê di qada perwerde û fêrkirinê de erkê dewletê bo xîteya gotinê neşiyar bûn û

JÊDER

1-Robert Botransî wer tasorê perwerde, kovara Aso yê perwerdeyî, jimare (1)sal:2000 li 28

2-Newzad Ezîz, Psîkolojiyayê fêrbûn xebatê xwendevanan, jimare 57, 2002 li 40

3-Ebdilhelîm Samî, errayil alem el şaet Efrîqîya, şerqil mexreb, 2001 li 31-32

4-Îsmaîl Hacanî,(xeberdan ji helûl melûl)kovara Zaxo jimare 32, adar 2007

5-Tahsîn Navişkî, zivirîna biryara qutanan, Evro 183, 4,4, 2007.

6-Yusif Osman Hemed, saykolê cihayî barware giştî, Gulan 374, 2004 li 35

7-Dr. Mixtar Nihamîeryîlm alem el hereb ilaqiyyen , dan musarif mensal Qahîre, 1979 li 23.